


SAL 3  
HEJMAR 23  
—  
1944  
SIBAT-ADAR

# RONAHÎ

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR  
TELÉFON: 12--29

ANNEE 3  
NUMÉRO 23  
—  
1944  
FEVRIER-MARS



*Eskerine xaca sor darübesteke birindaran di teftan re dadixin rastê.  
Li rastê erebeyên birindaran wan dibin û digehtîn xestexaneyên gerok.*

ÇAPXANA TEREQIYÊ  
ŞAM — 1944

## DI VÊ HEJMARÊ DE

Nêcîra Kewan	Evdirehman Eli Yûnis
Fenên Dêw	Çirokbêj
Xezel	Nâli
Şeva Gayê Zer	Evdilkerim Mela-Sadiq
Dayin	Bîşarê Segman
Memê Alan	Evdilmesih Wezir
Selahedin	Osman Sebri
Bo Agadari	Gulavêj
Dengî Gitîyi Taze	Ronahî
Kudistan	Exbar-el-Herb
Lehistika Şetrencê	Cemîl Tacdo
Gula Min	Cegerxwin
Napolyon	Osman Sebri
Rewhani û biyanî	Hesen Hisyar
Cêwikên Siyamî	Smaînê Serhedi
Merêsal Lüksenborg	Qadîre Ferman

## DÎBACA

### NÊÇÎRA KEWAN [1]

Carek ji cara, Xîşoyê Soso û Kaloyê Remezan  
 Çûn û gertyan li ferxê kewan.  
 Ji xwe re girtin du ferx ji ber mérkewan.  
 Pêşî xwedikirina wan li sindik û kull.  
 Li dû wê bi genîm û tehlî.  
 Hate meya Kanûn, berfê diwar sün  
 Kewgîrvan eba kîşandîn serê xwe û li halê xwe û  
 [ kewî xwe wer bûn.  
 Hat meha Sibat; tergîn ji qefesa hat;  
 Rebat qomgomî, celab sekini.  
 Bi xér hal, meha Nisan,  
 Vedan xweş bû disan.  
 Şahi ket mala xwey-kewan  
 Mêkew gîn ser hêka û ribat ketne lisan.  
 Rabû ser xwe Xîşoyê Soso, gazi kir Kaloyê Remezan;  
 Go rabe em herun vedana.  
 Şevdesta emê bavîjîn cîgeki kûr.  
 Kew bêne me wek ga û baqûr,  
 Emê tîji kin cenb û tûr.  
 Rojdestan emê baqîjîn kaya,  
 Kew bêne wek ker û wehşî,  
 Emê bikusînîn bi cenb û laşa.  
 Hêvarâ bavîje cîhe bêndera,  
 Tu godarı bîke li qren û sera.  
 Emê tîji bikin cenb û fera.  
 Şevdestek avelin cîgeki kûr  
 Rebat sekini celab lîmlîmi.  
 Pire-kew derket ser kevui.  
 Kir şaresar, qareqar, go ey celabê bêzar,  
 Carek ji cara, min tu ne di ji ser darê hatî xwar,  
 Hero seo, ez bi te re nakum tu bazar.  
 Ka ribatê te ê lal û nkûl-xwar.  
 Ribatî go here dêla, dêla, dêlayê  
 Tu jin î, xeberdana mun bi te re nayê,  
 Seyê mérê te xwe xistye bin deviyê deng jê nayê.  
 Ez ribat im, ribatî gunre me,  
 Şevdest û rojdest, bi xwe ewle me;  
 Restemê zal ez bi xwe me.  
 Pire-mêkew go, ey ribatê qut, qop û lal,

[1] Li ciyê me ew mirowê ko kewgîrvan e gerek vê  
 dibace bize; an-ne no kewgîrvan e.

## ÇIROKA KURDMANCI:

### FENÊN DÊW

Di zemanê berê de merivekî kor  
 hebû. Kureki xwe é dehsali hebû. Li  
 parsê digeriya. Rojkê ji gundan dihat.  
 Di newalekî de, li ber zinarekî rûnişt.  
 Keserek kişand. Di zinar da, deri vebû.  
 Dêweki serê xwe biderxist; ji mérîk re  
 go: Tu li ci digeri?

Mérîk şas bû; go min lawê xwe anî  
 ko tu bi xwendin bidî.

Dêw go: Saleke dî vê çaxê were kurê  
 xwe bere.

Deîf hate girtin; mérîk çû mal.  
 Salkê li mal rûnişt. Sala xwe bû temam,  
 ewê were lawê xwe bere.

Jinikén dêw dido bûn. Yek rind;  
 yek pîs. A rind ji lawik ra go: Sibe da  
 dêw ê banî te ke; ji te bipirse; jinêñ

Ji mi re hene, cil ferxê par û cil ê pérar.

Hemî nikûl-sor û celebdar.

Bêne te, wê pârtîka te, ji serê te bînin xwar.

Bila bi te nehese û dengê te sa neke mérê ê  
 [ dîjwar.

Ribatî go, Ez ribat im, ribatê qut im,  
 Bi çakûk û kelpedana ji ser ferşê kozikê-nalebitim.

Ez ji ser û lêxistînê re pir bi emliyet im.

Mérê wê navê wê Kormenseb e.

Kormenseb ji xew rabû, got jîna xwe ê ci deng e tê?  
 Jinikî go, ev Gulbarîn e, kewê Xîşoyê Soso ye,  
 Hatiye cihê me, fort û pesna dîke.

Kormenseb deng li zarowê xwe kir û go:

— Min divê hon Gulbarîn ji mi re bi şkélé piyê wî  
 [ ve bigirin, nekujin bi saxî bînîn cem min;

Ev ci bê-agîl e ko hatîye warê min.

Bi carek siğen bi ferxen wi ket û sırin,

Pire-mérkew, dilê wê-qerar ne da, ew ji çû.

Dema gîhiştî ber dafa û bi carkê alyiqin,

Pire-mérkewê gole aferlin Gulbarîn.

Kewê Xîşoyê Soso ê xwînawar!

Ji min re berde du ferxen par.

Ko min û kâtikê mérê min,

Wa bibin zozana û paizê bînîn xwar.

Gulbarîn go, girtin bi mnî e, lê berdan bi Xîşoyê  
 [ Soso û Kaloyê Remezanê bêtebiel,

İro sê ro, bi cinobel, ne kiriye tu limêj û tu taet.

Dûbêjîn Xîjo bi zmanê kewa de bû bû zana,

Rabû ji rehma xwe du heb berda.

### EVDIREHMAN ELİ YÜNIS

Me hêvi ji axê heye ko pistî vê dibacê, ji me  
 re nêçîren welatê Sasonê, herwekî devkî û bi awayê  
 xwe ê şerîn qise kiriye, bend bend di Ronahîyê  
 de binivîsit.

Kes nizane, heye ko dûr-nîzing digel axayê  
 delal em li ber wan kozik û çeperan rûnîn û  
 nêçîra ko axê ji me re qise kirine bi desten  
 xwe bikin.

## X E Z E L

min k̄jan rind e. Tu b̄eje ez nizanim,  
k̄la ko bi te rind e, ew rind e. Ewē ji  
te b̄pirse, te ilmē min hin kir, hin ne  
kir. Tu bibēj ez hin ne b̄um. Ewē bibēje  
eybe, sihe havē te è were, ezē jē şerm  
bikim.

Dēw jē pirs̄ı, lawik got-è: Wexta ko  
te ders dida min, ez hin dibūm. Wexta  
ko tu ji cem min radib̄yi, mi xwe ji  
bir dikir. Ez niha tiştekî nizanim.

B̄u sibe, havē lēwik hat. Ew li ber  
zinar sekint̄, destē xwe lēxist. Deri vebū,  
dēw destē lawik girt, teslimi bav kir.  
Bav lawikē xwe girt, çu mal.

Lawik ji bavē xwe re got; Ezē işev  
bi hespeki rind bim. Sibe min bibe  
mezadē. Ewē sed zēri bi te din. Pereyē  
xwe bigire, hevsarē min mede kesi,  
bîne mal.

B̄u sibe, bav rabū, di ko hespeki  
rind di xant de hatiye girēdan. Hevsarē  
w̄i girt, çu mezadē. Xelk gişk hatin.  
Sed zēr tē dan. Bav pereyē xwe girt,  
hevsar, ji ji serî jēkir; hat mal.

Ber ve évarē lawik hate mal go,  
bavo te pereyē xwe girt. Bav go herē.  
Lawik go, ezē işev bi deveki sp̄i bim.  
Min bibe mezadē, ewē bist zēran di  
min din. Pereyē min bigire, hevsarē  
min jéke, bîne mal.

B̄u sibe. Bav rabū, di ko devakî sp̄i  
hatiye girēdayın. Hevsarē w̄i girt, bire  
mezadē. Xelk gişk hatin. Bist zēr tē dan.

Dēw di mala xwe de go, insanē v̄i  
zeman̄ emel p̄e nabe. Dibe ko w̄i lawikî  
ilmē min hin kiriye; di nav xelkē de  
esker bike.

Dēw rabū, xwe tebdili qiyafet kir,  
hate mezadē. Di mezadē de, deveh nas  
kir. Çu bi bavē lēwik re bazar kir. Go,  
tu v̄i devayî bi ci didi. Extiyér go, ez  
bi bist zēran didim. Dēw bist zērē w̄i  
dan-é. Hevsar ji dest girt.

Extiyér go, ez hevsarē xwe nadim.  
Dēw go, mala min ve li vir e. Li şuna  
hevsar da zerekî din datyē. Hevsar ji  
dest girt û çu.

Lawik zan̄ ko paşı xerab e. Çawan  
kir ne b̄u. Çu heta ber zinar. Wexta ko

Zilſt bi qedet dake perişan e, bilaw e.  
Emro le min i şefle alâz û be daw e.  
Bo çi ne girtim sed kere tim dil deşkəni  
Mey boç ne rijē şışe le sed cige şikave.  
Omrikî diréjim be xeyali seri zilſet  
Sewda û perişan im û sewdayekî raw e.  
Herçende ke rüt im be Xuda maili rüt-im  
Bé b̄crgiyé il-let ke hetiw mail be hetaw e.  
Her coge û cégaye ke wa sâr û siwêr bê  
Çiyî cüßeşti giryani min e, xwê-nerijawé.  
Bé faide ye men'i min êsta ke le giryân  
Bo aşiqi bêcâre zû em ave rijawé.  
Sâzi dîlime bâisi ta û kul û giryân  
Malûm e ke agir sebebi cüßeşti aw e.  
Manî nigeli qeweli teswîri biroyi to  
Em qewse be desti miteneq-qış ne kışawé.  
Nallî weki zilſet ke mitîi berî pêt e  
Têklî meşkêne be cefa meyxare law e.

## N A L I

dēw çu hundir. Lawik serê xwe da  
serderâ derî da. Hevsar di seri da jêbû.  
Lawik li xwe xwend, b̄u kevok, ket hewa.

Dēw di ko lawik firî; w̄i ji li xwe  
xwend, b̄u bâzek kete pey. Lēwik di ko  
xelas nabe. Beşçeki mezin di; hewzek  
di ortê de ye. Di dorhêla w̄i hewzî ra  
paşaler rûniştine. Lēwik li xwe xwend,  
b̄u guleke sor, kete orta hewzî.

Dēw ji li xwe xwend b̄u mitirbek,  
saz bi piyê w̄i ve; hat temena kir, bi  
edeb rûnişt, sazê xwe lêxist.

Xulameki ew gul girt, da paşayê  
mezin. Paşa ji destê xwe kir bêrika xwe,  
pere biderxista ko bi mitirb bida.

Mitirb go, ez pera naxwazim; bira  
paşa wê gulê bide min, ji min re' bes e.

Paşayê mezin ew gul da mitirb.  
Lêwik di ko iş xerab bûye. Li xwe  
xwend, b̄u garisê zer, rijiya erde.

Dēw ji li xwe xwend b̄u qurkek bi  
deh çelikén xwe ve û garis ji erdej di-  
neqandin. Lawik li xwe xwend b̄u  
roviyek, qurk ji xwar, çeli ji xwarin.

Lawik disa b̄u meri. Paşaler lê ecêb-  
mayî man; gotin ev ci iş e? Lēwik ji  
wan ra qise kir û mesele got.

Ji hingê va dēw insana hînt fenê  
xwe nakin.

## ŞEVA GAYÊ ZER

*Şev à rojek Kanûn ma bi. Pirek hebi bi çar kura ve; gayeki wa i zer hebi, jiyina wa bi wi gayi bi. Évara Kanûna-Paşın xelas bi bi. Babê pîr derket ji derve, temaşeyek li ezmanâ kir, hat hundir got zaroken xwe:*

*Lawén min ez vê şevé xirab dibinim, rabin gayê zer şerjê kin, agirî xweş bikin stilê kuç kin.*

*Zarén wi gotin-ê: babo jiyina me li ser milê vî gayi ye, eme çawan dil bidi vî gayi şerjê biki. Babê wan got: Wek min ji we re goti ez vê*



BERGEHIN JI ŞAGIRT Ú DIBISTANËN GUNDEN İNGİLÝSTANË

*şevé gelek şedar dibinim; şerjékirina gayî wê rihe me hemiyan xelas bikil.*

*Li ser vê yekê ga şerjê kirin, aqir xwes, stil kuç kirin. Ji évarê pé de berfê lê kir, berfê ke boş û ecêb.*

*Demek yê şevé pirê aqil rabî derket ji derve, nêri berfê wê serban teji kirin, kefenek spi aveti ser dinyaqe. Hema hat lawelet ji yên xwe hîşyar kir û hestik têr goşt û germ da destê wî, go de rabe lawê min berfmalê hilîne, here serê bani, berfê bavêje.*

*Kurikî ew goşte germ bi dest xwe girt, berfmalê hilîni çû serê bani, sekiri ji gazê bêtir-wê berf bari. Berfa li -ser bani hemi malişt û vege riya ber agirî û li cem sitla goşt rûnişt. Demek di çû: pirê hîşyar carekê derket sekiri wê berf dîbarit, lê barineke ecêb. Cardi hestik ji yên goşte gayî da dest lawê xwe ê cîn û berfmalâ dest û got-, rabe kurê min lê e serê bani. Wi ji ukek birayê xwe ew le fa gezek di bari, malişt û lat xwar.*

*Bi vi awayi babê pîr her saelê kurek yê xwe ji xew radikir û qetik goşte germ dida dest û redikir serê bani, berf ji ser bani dimaliştin, heta li wa bi sibe.*

*Sibehi nérin di wi gundi de ji wa pê ve tukes ne maye, hemi mayin di lin beşfê de, serban li ser wa de halin xwar, di bin wê berfa ecêb de hemi çuyin. Iñgê pirê lişyar û aqil got lau ên xwe: Ueve dîl, ukek mi ji we re goti ev şev à rojek kanûn çığa gelike. Gayê zer ne stêleh bi, jiyina me li ser milê wi bi. Lê iro ewi gayî rihe me her penaça û bi diya we ya pîr ve xelas kir.*

Evdilkerim MELA-SADIQ

# D A Y İ N

Li wextê berê, di heyamên kevin de mîrek hebû. Mîrekî ciwan, çeleng, xudanbext û bi destê xwe mîr. Mîr Tacîn digotin-ê. Mir welatekî mezin û fireh, erdeki bijûn û dewlemeden hebû. Mîr ew welat bi qeweta şûrê xwe vegirti bû û dîsan bi şûrê xwe berevaniya xekl û erdê xwe dikir.

Neyaran serî hilda bû. Ji mîr re diviya bû li xwe biçewimanda û bicîwa şerê wan. Mîr berê xwe da bû erdine bêpivan, welatine dûr. Di paş xwe re jîn û kurê xwe ê şîrmêj Heyvind, yê ko hêj di landikê de bû hiştî bûn.

Heyveke çardeşevî li çûna leşkeren mîr temaşî dikir. Mîr da bû pêşiyê; mîrxas û şûrkêwî hespîn xwe di dora mîrê xwe de dibezandin. Ji banê qesire jina mîr ko navê wê Heyvê bû bi çavine zelûl li çavine dinihert û lêvên xwe hêdîka dilivandin; qey diayek dixwend.

Heyvê kêm kiri bû; hetanî ko nîvê şevê di ser xwe ve derbas ne dikir xwe şanf ne dida. Siwarekî birfîndar, rîmh û şûrê wî şîkestî bi xar hatî bû û li ber deriyê bircê sekinî bû. Dîr jê re vekirin. Qasidekî ne i xêrê bû. Mîr û leşkerê xwe keti bûn deravekî teng. Heft rîmh di canê mîr re çû bûn. Bi a heftan re mîr ji hespê xwe bêrih keti bû erdê; eskeren wî ji hev de keti bûn. Neyar bos bûn. Bi piraniya xwe ew şkînandi bûn.

Jînmîr pê hesandin. Berdevk di dora dergûşê de li hev gihane hev. Mîrê ko li ser textê bayê xwe rûnişa hêj yanzdeh-mehî bû. Ji diya wî pê ve tu dostê rastîn jê re nîn bû. Ma dê, diya reben wê çi bikira. Herçî mirov û pismamén mîrê şîrmêj wê hemiyan cavêن xwe berdaya texî seltenetê. Mameki Heyvind hebû jê re digotin mîr Şem. Ji herkesî bêtir ji mamê wî ditirsîyan. Belê mîrê rehmetî birayek hebû ko ne ji diya wî lê ji reşîkê bû. Di heqê mîrê şîrmêj de mam ji herkesî bêtir xeternak bû. Mîr Şem mirovekî dilhişk û xwînxwar bû. Jê ve mîrîftî, mezînahî, mirovatî ji dirhavane pê ve ne tu tiş bûn. Gava pere û gewherên ko di xezna mîrîtiyê de bûn dihatin bîrê, çavê wî ji wan madenan bêtir diçîrisin û agir diweşandin.

Mîr Şem di serê ciyê de qesirek hebû; tê de digel diz û nijdevanan wekî gurekî diji û



BERGEHEK JI KÜÇEYÊN ŞANGHAYÊ

cavên wî her li şikarê bûn. Ew jê re şikarek. Mîrekî yanzde-mehî, xwediyê welatekî mezin, xudanê xezneyê giranbeha; lê ji her tişî bêxeke de landikê de nivistî û her û her li çîcikên dayîna xwe digerîha.

Di rex landika Heyvind de landikeke din xuya dikir. Ew landika kurê dayînê, landika kurê Heyzebûna cêri bû. Belê mîr Heyvind û kurê cêriyê di şeveke Havînê de ji diyîn xwe bû bûn. Dergûşa kurê cêriyê a darîn anî bûn tenîta landika pismîr a zérhîfî û her du zarokan pismîr û xulamkole ji yek guhanî şîr dimêtin. Évara, gava jînmîr dihat û li kurê xwe temaşa dikir û ew dida himbêza xwe ji bo xatîre lawê xwe kurê cêriyê, xulamkolê xwe ji maç dikir.

Herçî cêriyê li her du zarokan bi yek mihirvanî û dilovaniyê dinihert. Ji xwe yek kurê wê bû; û din wê bibiwa mîr û mîlkî wê. Rojêne ko şîrê wê kêm dihat kurê xwe birçî dihişt, pismîr têr dida mîtin û di dilê xwe de digot: divêt mîr ji peyayê xwe xurtir bit.

Dayîn Heyzebûn di mala mîr de ji diya xwe bû bû. Ewgend bi axayên xwe ve girêdayî bû ko ew hezkirin jê re bû bû ol û diyane-tek; jê re perestiş dikir.

Wextê mîr di keviya çemê mezin de hate kuştin Heyzebûn ewçend giriya bû ko jînmîr bi xwe hêstirên xwe dimâliştin û li ber dile cêriyê dida.

Heyzebûn ibadeta mezhebeke kevnare dikir. Li gora wî mezhebî mirov pişti mirinî, di cih de vediyya diçû ezmanan û di pişti ewran re kar û xebata xwe pêş ve dîbir. Ji lewre Heyzebûnê digot ko mîr Tacîn hilkişîyaye ezmanan û li wê derê hikimi eşîr û

welatan dike. Ji 'xwe birek ji peyayên wî ma pê re ne miri bûn. Wan û hespê wî tev de xwe gihandi bûn mîrê xwe. Herç berdevk û şürkêşen mayîn ji hin bi hin wê bimiriyana û wan ji xwe bigihadana mîr Tacin. Vêca mîr di ezmanan de kişwêrê xwe bi temamî wek li rûyê erdê dê saz bikira, Heyzebûnê welê digot.

Ma rojekê ewê bi xwe ji ne ciwa ezmanan û difsa xulamîtiya mîrê xwe dê ne kira. Digel vê hindê gava mîrê şîrmêj dikir himbêza xwe û şîr dida-yê bi çavine zelûl lê dinihêrt û direcîff û digot «Xwedê vî ji me re bihile; heta ko bi bejinê bi ser qama sûrekî bikeve; kî dizane ci talûkene nenas li ser riya wî xwe veşartine» û digirf.

\*\*

Ji roja ko siwarê birfndar xebéra mirina mîr Tacin anî bû sûrehêن quesirê asê û pasvanen wê zêde kiri bûn. Hero ji tevdîrine nû diditîn; talûke ji hin bi hin nîzingtir dibû. Mîrê bêjî û nijdevanen wî ji ciyê dakteki bûn deşte, li ser riya xwe her tişfî xerab dikirin û berê xwe didan payfîtextê welêt, quesira mîr. Lêbelê xelkê quesirê digel her tevdîre ve qey sehiw girti bû. Li quesirê nema inzibateke nêr hebû. Ma teşî kengê dikare bikeve şûna şûr. Li quesirê jinikekê hikim li jinan dikir. Ji milê din torinêne welêt yêñ ko bi mîr re girêdayf bûn ew ji di wî serê mezin de pê re miri bûn.



Keçen Ingilistanê herweki di fabrikan, di zevyan de ji dixebeitin.

Xelkê' quesirê, di pêşıya hemiyan de diyâ mîrê piçük, hero her saet li hêviya felaketekê bûn. Bi tenê dayîn, Heyzebûna sadiq ne ditirsiya. Gava mîrê xwe ê şîrmêj dikir himbêza xwe jê ve welê bû ko milen wî ji mîrê wê re sûrehîne stiwar in û di nav wan sûrehan de tu tişl nikare dest bidit wî.

\*\*

Şevelkê, ji sevine adetî reş û tarifir, dayîn keti bû navbera her du landikan û dikir ko binive. Ji nişkekê ve, ji dûr ve dengek seh kir; wek şinginiya sur û xenceran, şinginiya surên ko bera hev didan. Deng hêj dûr bû, ji xelaska hexçan dihate bihîstîn.

Dayînê xwe li mîzerê pêçand, rabû ser ejnûyên xwe û guh dida. Edfî pêjîna lingan dikir, nalinina didan pey hev... carina tiştek wek bareki giran dikete erdê.


Heyzebûnê da xwe, rabû ser xwe û deri vekir. Di lîwanê de peyayine biçek di ber ronahiya fanosekê de dimesiyan û qesta oda mîr dikirin. Hertişti xuya dikir. Bêjî bi ser quesirê de girti bû, zora pasvanan çû bû; niho dikirin mîrê wî birevînin û wî bikujin.

Dayînê deri li xwe girt, li landikan zivirî û bêf ko bide eqilê xwe rahişte mîrê şîrmêj û ew avêt nav landika kurê xwe û tê de veşart. Herç kurê xwe, ew ji kire himbêza xwe, qend caran ew maç kir û xulamkole kire nav landika mîrê xwe a zérhîft.

\*\*

Di vê navê de deri vebû, mirovekî bejinbilind, hewranîkî reş lê, digel çend mirovîn din ên biçek kete odê û berê xwe da landika mîr, lihêf rakir bi derbeke hişk zarok jê deranî, destekî xwe danî ser devê wi û ew kire bin çengê xwe. İşe wan temam bû bû; hemî di lîwanê re vegerîyan bexçê û di tariya şeve de winda bûn.

Mîr di landika xulamkole de dinivist; dayîn ji piyan sekîn bi çavine heyîf li dora xwe dinihêrt; qey tiştekî jibirkirî dixwest binê bîra xwe.



*Esekerên britani di taliné de. Ev eskerén ha-xwe kar dikan ji bo eniya  
dadowan. Xwe, hini daketina bejê dikan; beja Europa roavé.*

Pejin bi qesirê keti bû. Xelkê qesirê bi şeb-xûnê hesiya bû. Çira û xetirek vêxisti bûn; ji her aliye qesirê rarprega lingan dihate bihîstîn. Jinmîr, nîvtazî û digel nedîmeyen xwe li dayînê der bû û xwe li landika zérheli daheland. Gava ew wala dit qîrsînek jê çû û jinmîr bêhiş ket erdê.

Di vê navê de di lîwanê de reprepa lingan xurt bû bû. Serhengê qesirê digel segmanen xwe li diya mîr digeriya. Serheng digel segmanen xwe da bû pey bêjî û beriya ko terka bajêr bidin xwe gîhandi bû wî û li bev xistî bûn. Segmanen qesirê bêjî û peyayên wî tev de kuşti bûn û cendekê mîrê bêjî kaş kiri bûn beta ber deriyê qesirê.

Belê segmanan bêjî kuşti bû, lê wî ji beriya ko bimire di bin hewraniyê xwe de mîrê welet ê şîrmêj xeniqandi bû. Cendekê wî û hûr li hewraniyê mamê wî pêçandî li ber deriyê odê bû.

Jinmîr bi reprepa lingên segmanan hişyar bû bû, çavê wê bi xelkê dorê ve zelal dibûn. Dayîn rabû ji landika darîn zarokek derêxist û ew da desten jinmîrê. Herkesi ew nas kir; mîr Hevind bi xwe bû. Ma bêjî ew ne xeni-qandi bô?...

Dayînê bi çend gotinan biserhati ji haziran re da zanîn. Li cendekê li-ber-derfî hûr bûn. Ew kurê dayînê bû. Jinmîr kete himbezâ dayînê û bi maçikine germ ew maç dikir.

Qîrsînek ji xelkê rabû; herkesi digot, divêt dayîn bête xelat kirin. Ma behayê mîr hebô? Kaled rabû û got, eme dayînê bibin xezna mîrekan, bila bi destê xwe xelatê xwe bibijîrt.

Jinmîr destê dayînê girt û berê xwe da xeznan. Torin û segmanan bi heyecaneke xerîb dane pey. Dergehîn giran û hesinîn bi

dengekî rizihayî hêdfî hêdfî û bi heşmetî û depdepe vedibûn. Hundirê xeznê tarî bû; reş dikir. Di wê tarîtiyê de, wek çavên dehbeyen ko di reşâ sevê de diçîrisin, niqleyine hûr û gîr diteyisîn.

Xulaman qerase ji pişt penceran rakirin û depen hesinîn li hundir ba dan. Tirijine tavê ketin hundirê xeznê. Niho ew niqteyên res eßkere bû bûn; ristikine lûlû, gerdeniyen almas, guharine yaqût û ziberced, qevdine şûrine zérheli, navlûyên şeşxaneyen giranbehâ, kumzirhine bi neqş û xemil... û her tişlen kevin, giranbehâ û nadide...

Hejesî li dayînê dînihêrt. Gelo ewe çi bistanda. Heyzebûn di orta xeznê de sekinî, çavên xwe berda bûn ber xwe û ne diqeliqi. Pişti bîhînekê çavên xwe rakirin û di pencerê re li ezmanan fedikirî. Roj hêj nû hildihat û li singa ezmîn pinine sor û penbe belav dikirin. Belê kurê wî û delal niho di pişta wan ewran de bû. Taşte nîzing bû bû, herhal lawik birç bû û li guhanen diya xwe digeriha. Ma ne diviya bû ko xwe bilezanda û biçîwa nik kurê xwe û şîrê wî bidaya...

Dayînê destekî xwe rakir û ber bi pêş çû. Dilê herkesî tavet, golo wê çi bistanda? kijan gewherê giranbehâ. Heyzebûnê dudîlî ne kir, hemâ rahişte qevda xencerekê; xencereke kevin û biqîmet; xencereke zimridqevd; yadigara pêşyan; hêja bû eyaletekê. Dayînê çavên xwe li xelkê gerandin ew li ser jinmîrê sekinandin û hêdfîka got: Mîrê min gihaşte selametê, niho divêt ez herim kurê xwe bîmjeñim.....

Ü xencer di dilê xwe re kir.

Dihok: 2 Kanûna-paşîn 1944

BIŞARÊ SEGMAN

## MEMË ALAN

Me kurdan edebiyateke niviskî, ji çend klasikan pê ve, hesêb nîne. Lê me edebiyateke xelkê e welê heye ko ew li nik kêm miletan peyda dibe. Ji vê edebiyatê re folklor dihêjîn.

Belê folklorâ kurdan ewçend mezin û firehî e ko em pê dikarin iftîxar bikin û di nav xelkê de serfiraz bigerin.

Di folklorâ me de, bêşik şaheser Memê-Alan c. Memê-Alan malê miletakî ewropayî biwa Xwedê dizane di heqê wê de heta niho çend cild kitêb dihatine nivisandin. Me kurdan ewçend guh ne da-yê, ji sair û rôberê me ê mezin Ehmedê Xani pê ve. Belê Xani beri sê sed salî bi qîmetâ vê destançirokê hesiya û rabû li ser himê Memê-Alan kitêba xwe a mezin û abadin Mem-û-Zin anî wiçûdê. Bi gotinîn din Memê-Alan bi navêki din bi nav kir û jê re Mem û Zin got û serfin xiste navbera çirokiya xelkê û esera xwe.

Ji xwe herweki nas e, Xani bi hêncela çirokê deng li miletê xwe kir û dil kir ko wî li nijad û qewmîyeta wî hisyar bikit.

Ji hingê ve ji 300 salî bêtir wext di ser me ve cûne. Kesi guh ne da Memê-Alan, heta roja ko kurdizanê hêja û bilindpaye Mr. « Roger Lescot » ew digel tercimeke fransızî gîhanê çapê(1).

Herweki me got, ev destançirok di piyî Xani re bû xudanê du navan: Memê-Alan û Mem û Zin.

Herçi Memê-Alan, li gora hewérkeyan guhartoîne gelêr hene. Xani hin tîst li Memozina xwe zêde kîrinê û ji milê din tişline din ji kitêba xwe bi der hiştine.

Vê pasiyê çavê me di kovareke erebi (2) de bi bendekî ket. Yekî bi navê Evdilmesih Wezîr di wê kovarê de û di heqê Memê-Alan de nivisarek belav kikiye. Mr. Evdilmesih herweki bi xwe ji dibêje mîrdîni ye û Memê-Alan di zarotiya xwe de biliştiye. Benda Mr. Evdilmesih hêja ye. Evdilmesih qedir üşqîmetâ Memê-Alan herweki sezayî wê ye geleb bilind gîriye. Mr. Evdilmesih xemân dixwe ko ev çiroka hêja ne halî ye wergerandin zimanîne din û li dînya alemê belav ne bûye. Welê dixuye ko Mr. Evdilmesih tercime Mr. « Lescot » ne ditîye.

Mr. Evdilmesih pişti ko wesfê destançirokê dide sulaseke çirokê ji

[1] Institut français de Damas. Collection de textes orientaux. Tome I. Roger Lescot. Textes kurdes. Deuxième partie. Mémoires. Beyrouth, 1942.

[2] El-risale we El-rîwâye Qâhiré, 12 Çirîya-pêşîn 1942. Sal 10. Hejmar 484.

dibêje. Çirokiya Mr. Evdilmesih ji guhartayê ko em nas dikin xêlî bîserg e. An Mr. Evdilmesih bi zemanî ve esîle çirokê ji bir kiriye an çirokbêjê wî jê re welê gotiye. Herhal ev minho ji bona me guhartoyeke nû ye. Em gelek spasan ji Mr. Evdilmesih re dikin.

Mr. Evdilmesih sername benda xwe kiriye « Mem û Zin » Sermama Xani û ne ya xelkê. Heye ko çirokbêjê wî, ev ji jê re welê gotiye. Ev e nivisara Mr. Evdilmesih. C. A. B.

## MEM Û ZIN

### TEMAŞEKE KURDİ E ABADÎN

Mem û Zin navê çirokeke strandî e kurdt abadin e. Vê çirokê kurd û hin nekurd(1) ji, di Iraq û di welatên ko kurd té de dijin, wek Sûriye, Tîrkîye û İranê, distrinîn.

Hêj di bira min de ye, li Mêrdînê di şevên Zîvîstanê ën sar de, em zaro digel dê û bav û nasen xwe yên ko ji bo vê yekê dihatin, di dora tenûrê de, em digihan hev û ker û lal me guhdariya dengbêj dikir. Dengbêj ko bi dengê xwe û zelal û tebî ji me re Mem û Zin digot.

Dengbêj gava bîhîna xwe dida, çirok ji me re bi erebi qise dikir(2). Stran û çirokê heta derengîya şevê dom dikir. Pişti stranê em dînîvislin û me di xewna xwe de evîniya her du aşiqan a tehil ya ko bi mirina her diwan temam dibû, didit.

[1] Em tucuran rastî wan ne hatine.

[2] Dîvît ev adet xweseri Mêrdînê bit; an dengbêj bi xwe ne i kurdmanc bû.



Mêr di qada serif de ne, jin dikin bi karê wan rabin. Belê jin bezînê hewarê lê mîr ne ketîne kewarê. Ev jinên ha keç û jinên masfvanan in; toran saz dikin da ko herin masfvaniyê.

Nik dile min çtroka Mem û Zinê bi héjabâna xwe ji çtrocén Yewnanistana kevin ne këmtir e.

Mem û Zin yek ji çtrocén kurdi ye. Hinén din wek « Derwêşé Evdê » « Çiyayé Mazi » « Feltî Quto » hene ko qe. ne hatine belav kirin. Bi tenê Mem û Zin bi zimané kurdi ketiye çapê û hatiye belav kirin. Eu cara pêşin e ko xulaseke Mem û Zinê bi zimanekti din téte belav kirin.

Min di kitêba « Elf leyle û leyle - Hezar û şevezê » de çtrokeke piçûk ditiye ko dimine Mem û Zinê. Nik. dile min yê ko çtrocén « Hezar û şevezê » dane hev ew çtroc jî Mem û Zinê girtiye. Hingê ji Mem û Zin di nav kurdan de dîhate gotin.

Min hêv ji Xwedê heye ko rojekê şaireki erek t mezin an yekl bityanî vê çtrocé bêxe şikilê temâşayê an qesidê û herweklî gairê ingîltî « Fiç Jérard » ji bo çartnén Xeyam kiriye, nav û dengê wê bêxe dingayê».

## ÇIROK

Li wextê berê di welatê Kurdistanê, di bâjarekfî ava û çarnikarên wî bi çiyan dorgirfî de, mîfrekfî ciwan bi navê Mem hikim dikir. Mir bi pakiya esil û nijad, bi merdî û mérâñ û bi lewendiya xwe deng da bû.

Mem ezeb bû û qet ne tanî bîra xwe ko jin bikit. Ji ber ko di welatê xwe de tu dotmîreke çelengya ko jî re bi her awayî bîba hinkûf ne didit.



Rojekê wezfrêñ wî jê re qala ziwapê kirin. Mir li wan venegerand û xwe ker kir. Wextê civata wî belav bû mir çu nav cihan da ko rakeve. Mir texmîn dikirin. Belê diviya bû jin bîkira da ko warê wî kor nemînit. Mir di van texmînan de bû ko di xew re çû û xewnek dît.

Mir di xewna xwe de xwe gihandi bû bajaref Cizîrê — Cizîra Botan — Cizîra ko li keviya Dicle bû û bi darf Siya Zin, keça Mîrê Cizîrê keti bû. Mem û Zin şevê pêde li rex hev man û bi şeraba evinê a safi serxweş bûn; qerara xwe dan hevündin bistinîn. Mem Zinê ji birayen wê Çeko, Heso û Qerertacdin dê bixwesta. Ji ber ko bavê Zinê, Mir çû bû rehmetê.

Mem û Zinê hingustilêñ xwe ji pev guharti bûn. Memî hingustila xwe bi tiliya Zinê ve, Zinê ji ya xwe bi tiliya Memî ve kiri bû. Pişîf guhartina hingustilan Mem û Zin xwe li textekî dirêj kirin. Memî şûrê xwe dansî navbera xwe û Zinê da ko beriya mehirê tu tiştê neşeri di navbera wan de neqewimit.

Mem bi xwendinêñ teyran yêñ ko sira bê digihandin guhêñ wî, hişyar bû û gote xwe:

## JIN DI ESKERIYÊ DE

Kîşa milî çepê balafireke ko balafirê vedigere bende-behri e fêris şani dide. Yêñ ko di dora balafirê de ne û pê mijîl dibû tev de jî banzinê dadigirin û li her lişînê wê miqatê dibin. Bi gotînêñ din balafirê du texlit siwar hene; ên şerevanî û ên neşrevanî. Siwaran wê û şerevanî jin in. Lê ev peyagân neşrevanî ji, carina û gava dijmin bi ser balafirêhê de digire, dikevin bin barana bombe û gulan.

Belê di vî şerî de jinê europayî ji her şerîn berê bêtir têkili şerî dibin. Herçî em kurd dîvel em li wan ecêbmâyî nemînin. Ji ber ko jinê me ji qal - û - bela de di şeran de ji arîkariya me dikin; li rex me rûdinin, tifingêñ me da-digirin û heke me sisîkir nav di me didin û dibejin:.... kitana serê min li serê te....

« Çi xewneke şırın bù; xwezi ez ji vè xewnè hişyar ne biwam ». Ü gava çavèn wì bi tlılyen wì ketin; bala xwe da ù dít ko hingustila tiliya wì ne ya wì ye. I'serhatiya şevè bi temamî hate bira wì. Hingustil di çavè xwe re kir ù li ser wè navé siliya Zin xwend. Hingè zanî ko xewna şevè ne xewneke adeli lè heqîjet bù. Heçî sûretê siliya Zin terka xiyalâ wì ne dida.

Ji milê din siliya Zin di qeraxa çemê Diclé de gava ji xewê hişyar dibû wè jí digot ko şevédin xewneke şırın ditiye. Lè wextê cavâbi hingustila xwe kîr ewê jí zanî ko tiştè şevédin ne xewin lè rastî bù. Sûretê Nemî jí li xiyalâ wè hati bù neqîş kîrin.

Di rastiyé de jí tiştè ko li Mem ù Ziné qewimf bù ne xewin bù. Şeva ko Mem bi wezîren xwe ve qala ziwacé kiri bù periyân Mem xisti bùn xewneke giran; Zin jí nivinanîn ù ew anîn nik Nemî. Bi vî awayî Mem ù Zin hetâ fecara sibî li cem hev man. Bi spêde ve periyân ew cardî nivinanîn ù Zin vegerañdin bajarê Cizirê.

Mem gava bi xwe hesiya sond xwar ko ji

keça mîrê Cizirê, siliya Zin pêvè tukesi nakît. Li ser vê qeraré Mem rabû rexî ù bostê xwe girêda, li hespê xwe siwar bù ù bêf ko xelkê xwe pê bihesine, ji bajér derket ù berê xwe da Cizirê. Ewê vîna ko şevêdi periyân ani bù rex textê wì nîşan bikira.

Pişî sefereke dûr ù dirêj Mem gihaşte bajarê Cizirê ù bù mîvanâ her sê birayêni siliya Zin. Wan jí qedirekî mezin jê re girt.

Zin bi batina Mem hesiya bù. Zinê ji bo ditina Menî her fedakari da bûn ber çavèn xwe û di tu tevdîre de teqsîr ne dikir. Dawiye gihaşte miradê xwe û jí ker ve diçû ba Mem. Belê wextê ko birayêni wè diçûn nêçfrê Memî tiştek behane dikir û li qesirê dima. Zin dihat qesira birayêni xwe û digîha Mem.

Di qesirê de bi navê Beko-Awan wezîrek hebû. Beko miroveki dëxsok û fesedkar bù. Beko ji Memî hez ne kiri bù û lê bi kîn bù bù. Li firsendekî digeriya ko xirabiyê pê bikit. Beko bi evîna Mem ù Zinê hesiya bù. Li ser vê yekê rabû li nik her sê biran fesadî kir û qiseta xweha wan gel Memî digote wan. Lè her sê biran ewçend guh ne didan-ê.

Dîsa rojekê Mem bi hênceta nexweşiyê ne çû nêçfrî û li qesirê ma új Zin jí hate balê. Mem ù Zinê di ştexaliya evîne de xwe ji bîr kiri bùn. Her sê bira digel Beko ji nêçfrê vegeriya bùn û berê xwe da bùn dîwana ko Mem lê rûnişti bù. Mem gava ew ji dûr ve dîtin ebayê xwe ê fireh vekir û Zin ë din bîn wî de vêşart. Lè kezike Zinê jí derive ma bù. Gava her sê mîrê Cizirê ketin hundir Mem bi hênceta nexweşiyâ xwe ji ber wan ve ranebû. Herçî keziya jí deriveyî ji Beko pêvè tukesi ew ne dîti bù. Beko nîzingi li birayê mezin Çeko kir û li guhê wî pispisand:

— Ev mîvan ci miroveki kanc e ( qebe û kêmebed ). Ji ber we mîrekan ve ranebû û di cihê xwe de rûnişti ma. Heçko hon xulamén wî an kesine adetî biwan.

Çeko lê vegerañdin û got: Tu jí ci miroveki kêm û fesadî, heke ji ber me ve ranebûye ne ji ber quretiyê lê ji ber



Serevanîyen wextê berê xwe di nav kum û kiras-zirhan de vedişartlin; yêni tro xwe didin ber talda diwarêng tangan ên pola.


**nexwesiyyê ye.**

Peko: Belê ne-rabûna wî ne ji ber quretiyê ye. Lê ne ji ber nexwesiyyê ye ji. Ez sehebeke din dibñim ko nahile mîrê mîvan rabit.

Peko ev got û keziya Zinê ya ko ji derveyî ebayî ma bû sanî Çeko da. Çeko Zin ji dîwanê gewiraûd û Mem da hebis kirin. Mem avêtin zîndaneke welê ko di cil pépingî re mirov tê de dicu xwai.

Mem cil roji di zîndanê de diminit. Zin ji di vê navê de dikit ko birayên xwe qanî bikit. Ji wan re meselê dibêje, ko Mem destgirtiyê wê ye û hatiye wê ji birayên wê bixwazê. Dawiyê Zin fesadên Beko pûç dike û Mem ji birayên xwe re dida eftîw kirin.

Roja ko Mem dikir ji zîndanê derkeve Zin ciline spehf li xwe dike, xwe dixemiline, û digel cil keçen keçin yêñ ko ji nav bajêr bijartine, qesta zîndana Memî dike. Gava di-gehe serê derince, Zin deng lê dike, Mem lê dinêre û wê di wê bedewîf û spehlîtiyê de dibîne. Zin di dilê xwe de dibêje ko Mem jê û ji birayên wê eniriye. Zin cardi deng lê dike û dibêje. « Memo, heke ji ber tiştê ko çêbûye tu ji min enîr, ve ne cil keçen bedew yekê ji xwe re bineqîne ». Van gotiuan wek brûskêkê li Memî didin. Mem di dilê xwe de digit qey Zin nema wî dixwazitin û jê kerixiye.



ZADÊ ZEVİYÊN İNGLÎSTANË BI KEMYONAN TÊQE AŞAN

Dilopek xwîn di difîna Memî de têtin û Mem bêrih dikevitin erdê.

Zin digel mewkiba xwe vedigere û şina Memî girdedîde. Ji xwe gelek neborit ew ji emîrê Xwedê dike û li gora wesiyata wê li rex Memî tête ve artin.

Pistî cil rojî her sê bira Çeko, Heso û Qeretaedin, Beko ji digel wan, dîsan derketi bûn nêçîrê. Di wextê nêçîrê de hespên nêçîrvanan di ser erdê ko Mem lê veşarti bû re derbas dibûn. Lingê hespê Çeko kete kortalekê. Çeko li kortalê nihîrtî. Ew tirba Memî bû, Zin li rex bû; her diwan hevûdin himbêz kiri bû. Beko gole mîr:


— Ma lu nabînî pistî mirinê ji dev ji xebaseta xwe bernedane.

Çeko li Beko hate ezebê, şûrê xwe kîgand li Beko da û got-ê: Hey melûn here cehenemê. Xwedê mirovên ko xebisên wek te ji hev kiriine di aixretê de digehîne hev.

Beko ji hespê xwe de bêrih ket û cendekê wî ji tirba Memî dûr lê di wî erdê de veşartin. Fîstî mideki her sê biran tirba her du aşiqan ziyaret kir. Di ser tirbêن wan re gul û ecekine spehfî bişkîvî bûn. Di nav wan de stiriyek hebû. Ew, ji dilopeke xwîna Beko ya ko keti bû wê derê car bû bû.

Hefanî fro tirba wan ziyaretgah e.

Beda: EVDILMESÎH WEZIR



Topine ingilizî en nû. Yen ko di qada şerî Italyayê de bi kar halîne êxistin.

# DİROKA JİNA SELAHEDİN

— 1 —



*ÇEND PIRS*

Ji mîj va dîbata bîra min ko tîstekî ji diroka  
îna ser arê kurd sultan Selaheddîn û Eyûbî  
bînîvîsim; lê mixabîn ko zanîa miî téra  
bîchâîna vê daxwaza hêja ne dikir. Erê  
çiqas ko mirî di dirokên tirk û ercîba da  
li ser gîha, rabûn, mezinîîlî û hikîndatîya  
vî kurde gevre gelek tîst xwendîne ji, teqeş  
( miheq-î ) ey zanîn ji daxwazeke hólê ra  
ne dibûn bingehêki xurt. Ji vê pê va her-  
gav min dîvê texnî guhêñ xwendevanén  
xwe ko ez ne peyayê qelem û zanfîne me.  
Heye ko ji bê surîwetiya kurdên zana, an  
ji şewata dile xwe, lê nerhal ji noçari ez  
bûne réwîyê vê rê. Ew riya ko réwîyen  
weki min nahevi...).

Dawî ji bex'ê çak, min di vî wari da bi navê  
(Jîna Selaheddîn û Eyûbî) kitêbêke xweser  
dit ko tê da jîna Selaheddin bi kurdî hatîye  
nişîsi. Kitêb, bi navê Dr. Ehmed Bêli; yekî  
mîsrî nişîsiye, lê pir kurt. Dêma çavên  
xwendevan di dawiya kitêbê da bi navê  
kaniyên ko têxistîyên kitêbê jê latîne  
standî dikeve, tê bîra wi ko dê diroka  
şerîne xurt û bi hingehing bixwîne. Lê  
gava bi nav rûpelan da dice, ji şeran  
navêwan wan bi tenê dibine; herweki Selah-  
eddin di wan şeran da ne westî be. Dawî  
tîstekî ko serê xwendevan germ bike tê da

nîne. Tevi vê yekê tinebûna kitêbeke  
çêtir di vî wari da, hişt ko ez wê bigu-  
hêzime zimanê me.

Heya iro di vî wari da ne-nivisina dirokeke  
xweser û hêja ji bo jîna vî peyayê rohelê  
ê yekta, bê şik ji diroknîvisen islamân ra  
kêmîyeke mezin e. Heke ereban ji sîltanê  
xwe ( ew sîltanê ko ol û welatê wan parast )  
ra ev qedir ne girtî bin ji; divê zanayê  
gelê kurd ji serderê xwe ê wek çirayê [1]  
ra vê yekê bikin.

Di guhastina kitêbê da heyâ ko mikûn be emê riya  
kîntur bigirin, ji ber ko hin qîrînê ( minaqe-  
şeyen ) bê fêde ez nânivisim. Bi tenê qesda  
min xulaseya diroka jîna Selaheddin e.

Herçî not anê şerh, min nivisine û xwediyê  
wê berpirsiyariyê me.

## SİLAHEDİN GEL Ü ESÎRA Wî

Kurd ne tîrk û ne jî ereb in; ew qewmekî  
ji rehî arî ne. Heye ko ji têveliya ereb û  
farisan giha bin hev[2].

Kurd di zemanê berê da li ser çiyan  
jiyîneke bedewî dijîn û di navbera welatên  
faris û Asiya biçük da rûdîniştin. Ev gel bi  
esebiyeta qewmi, rîbîrî û talankerî, comerdî,  
mîranî, parastina şerefê û hezkirina şeran  
weki erebên cahîliyê bûn. Di van rûcîkên  
( sifat ) han da jînên wan, ji mîrênen xwe ne bi  
şûn da bûn. Heye ko pir jîn di nav kurdan  
da bi davîstîn û gerandina şeran bi nav û  
deng bûne. Dema ev xurtî û şerûdî ji kurdan  
hate dîtin, hemî mîrekîn dorê dixwastin pişta  
xwe bi hevalî û arşakîriya wan û leşkerê xwe  
ji bi mîrxasên wan zexim û metîn bikin. Çi  
kesê ko kurd jê ra bibûna dest û arîkar, ew  
serdest û serfiraz dibûn. Tevi vê xurtiya han  
qewmekî dûrî medeniyetê bûn, lê ecêb ve serîşk  
û tu caran bindestiya biyanîyan qebûl ne  
dikirin[3]. Bi tenê rajêrî ji mezinên xwe ra  
dikirin ko her qebîleyen wan di gerandina sol  
û tevdîrên xwe da, e mîna hikûmetekê xweser  
bûn. Çiqas ko qebîleyen wan gelek bûn ji; lê  
hemîyan ol ( in ) û ziman yek bû.

Bi hikmî jîna bedawetê aşiqîn serî estî û  
serxwebûne bûn. Herçî zimanê wan fransî û  
gelek î nîzîkî farisiyê ye.

(1) Ji ber ko çira ne bin xwe lê dora xwe  
ronî dike Ma xwest Selaheddin teşbîhi wê bikin û  
welê bû!

(2) Hevoka paşin a pêşin bi birîn dike. Ev ji  
qelsiya baweriya Dr. Bêli a der heqê zanîna wî da  
ye. Çawan kurdan arî dizane û paşê dixwaze  
hêleke wan bigelîne nijadine din!.. Xweya ye camêr  
di bin te'sîra hin diroknîvisen ereb da maye. Ew  
diroknîvisen ko çaviya Nil gîhandine zimridin!...

(3) Xwazî bi wan kurdên camêr û bi rûmet.

Hinek dicroknivis gotine ko gava welaté kurdan bi hikumeta Farisan va girédayf bû, hercar seré xwe li ber hikumeté hildidan û bêdiliya melikén farisan dikirin. Dema ketin bin desté osmaniyen jî dîsa sîreta xwe ne guhartin û ji serxwerabûnan bi şûn da ne man.

Dayîn (deribe) li nik kurdan bi destê mixtaran téte cîvandin. Xelkê her gundiñ dayîna xwe dide mixtar û ew jî dide mîr. Pir caran hin qebile li mîfran radibûn û gava pê nikari bûn ji cih bi derdiketin. Bi vî awayf bûne gelek eşîran û pirén wan wekf ereb û tirkmanan bi koçerîyê girtin û bûne xweyî pez û dewar.

Kurd di pir rê û rézikên xwe da ji tirkmanan vediçetin. Herwekî kurd qelenê keçen xwe digirin; lê tirkman bi ser da didin zavayen xwe. Tirkman bi kok û binyata xwe dilgir nabin; herçî kurd di vî warî da ji her qewmî pirtir vê yekê diparêzin.

Kurd mirovine rûgewir û bejin-navîn in. Dicroknivis li ser navê gelê kurd ne bûne yek. Maltebrûn di kitêba xwe a bi navê (cixrafiya imûmî) da dibêje: « Li çiyayên Za'ros û Nigottis da hin qewmén hov hene ko bi nav û dengitîre wan gelê Kurtî ye. Esênefon ji wan ra, Kardûx; Plüterxos Gordwîn; Îmînmîr Qilîn, Kirdawîn û herç xweyî ce rasyêni dawiyê ji Kurd gotine.

Dicroknivis hêja Cerci Zeydan di kitêba xwe a ( Tebe, at el umem ) da dibêje: « Kurd mîletekî kevnar e, di dicro kevin da bi navê Kardûx hatine navandin ». Ji nîzikiya van navan a ji hev ra, xweya dike ko ji bo navê gelê kîrd tu ixtîlaf di navbera dicroknivis dan tine bûye. Heye ko ferqa di navbera zavayen ( lehce ) kurdan da ev ferq existiye

nava binavkirina dicroknivis. Na gava mirov lê hûr dibe, qenc xweya dike ko koka van navan yek e û hemî vedigerin bêjeyekê; herweki di zaravayê zimanê erebî da ji şerqine holê hene.

Li ser navê kurdan ji gelek gotin bûne. Hinekan gotiye ko kurd bi mana gur e[1]. Ji ber ko di welaté wan da gur pir bûne selkê wî welaté holê hatine navandin. Herçî zana û dicroknivis li ser vê bûne yek ko kurd arî ne. Ev gel di berê da li çiyayê Hordebanê û di navbera Mîdiya û Armeniya da rûdîniştin[2]. Paşê di navbera Dicle û Ferat da bi cih bûn ko bi vî erdi ra Kurdistan hate gotin, anê welaté kurdan. Kurd mirovine hov bûn û di nav rîl û deviyan da dijîn. Debara wan li ser xwedikirina pez û dewaran bû. Pişî ko bi tirkêni hov ra dan û standin, ji wan hîn dilhişî û şerûdiyê bûn.

Tevî ko kurd wekfî bedewiyan dijiyan ji, disa hin sinhet dizanîn. Geleki mîla xwe didan xwedikirina bizînen hîtik, cil û cawen pemboymî, risîn û evîşimîn jî çedîkirin. Bef van çêkirina tiştîn çermîn û sileh jî hinekî dizanîn ko ev sinheten han ji mehcetên bedawetê bûn. Hewcebûnê ev tiştîn han bi wan dane hîn kirin, herwekî xelkên Südân û Efrika navîn[3].

Ji eşireke vî mileti a mezintir û bi rûmetir Selahedin Üsif kurê Necmedîn Eyûb kurê Şadî kurê Merwan hate pê. Hinekî dicroknivis jî bo ko kok û reha malbatâ Selahedin bi malbatê mezîn va girêdin, ji Merwanê

(1) Ev mana han ne maneyeke kevnar, lê manayeke nuh e. Ji bo tirkandîna kurdan tirkîn kemalet ev mana ji navê kurd ra ditî bûn. Heye ko Dr. Bêli di bin te'sîra wê manayê da ma be Heke ne wêlê bûya, teví ko dibêje « li ser navê kurd gelek gotin bûne » bê vê gotina han tiştîkî nabêje.

Ere li ser mana navê kurd gelek gotta bûne, lê piyanîya van manan li ser bêjeya (pehlewan) dibe yek, anê kurd bi mana pehlewan e.

(2) Dr. Bêli nizaniye ko Mêdi jî birek ji kurdan bûn. Ev dera han ji pir kesan ra vesartî maye. Lê ne xwastîne bizanîn ko Mêdi çi bûne û bi kû da çûne! .

(3) Dr. Bêli bi vê tesbihâ han geleki zîmî li kurdan kiriye. Kurd tu caran mina Südâniyan û Efrikiyan nayêne hesibandin. Dema ko pêşveçûne sinhet li ser qenciyâ hesin bû, hîngî hesin kurdan di cihanê da bi nav û deng bû.



DI GIRAVÊN SÎLÊMAN DE TOPÇIYÊN EMERIKANI

## BO AGADARI

« Govari Ronahi » û roj-nameyeg « Roja-Nû » bi zimanî kurdî Botan le wîlatî Sûriye û Libnan derecîn. Pêwist e le hemî kurdêkî xwingerm xoy le ronakî em dû çirayê bêbey neka. Aboneyî salaney rojnameke (2) dinar e, hêy govarekêş dinarék e. Elewi xot bikeye be aboneyan be naw-nîşanî xware we dawayan bike:

Berxda. Kuliyetîlhiqûq. Cenabê Reşid Bacelan ».

Gelawêj Jmare 11 Sali 4.

Me ji kovara Gulavêjé gelek minet e ko kovar û roj-nameyên me di nav kurdên Iraqê de progegende kirine û bi vî awayî şanî hevdûgirtineke nijadîn daye. Bi tenê

di agahdariya Gulavêjé de gotinek heye ko emê li ser wê hinekî bisekinin.

Belê Gulavêjé gotiye: « bi zimanî kurdî Botan ». Celo ji gotina « kurdîya Botan » mexsed çi ye? Bê şik mexsed kurdîya ko di cihê Botan de pê tête axaftin e.

Ji miletê me re « kurd » dibêjîn û wek her milefi ew ji bi zimanekî xweser, daxêve û ji wî zimanî re ji « kurdî » dibêjîn. Çi milet çi ziman her du ji arî ne. Herçî ziman di nav zimanên arî de ji şaxa franî, ji birê hindo ewropayî ye.

Dîsan di zimanê me kurdîyê de herweki di gelek zimanên pêşkekîf de tête dîftin; zarin hene. Yanî zimanê

me di bin tesra gelek hêmanan (insir) de bi zaran lêk ve bûye. Ew zar jî ci bingehî de sisê ne: zarê bakûr zarê nîvîro û zarê dumîlî. l'ercî zarê bakur jê re kurdmancî dibêjîn. Yêñ ko bi d milî taxêvin ewçend têkîf kurdêñ kurdmancîziman in ko ji wan re sênc û tixub danîn dişwar e. Herçî zarê nîvîro zimanê kurdêñ welatjêri ye. Heye ko lorî û hewremani ji li gora batûra (binye) xwe bikevin nav vî zarî. Welatjorî ji vî zarî re û bi tevayî zimanê soran dibêjîn.

Em bêñ ser gotina « Kurdiya Botan ». Botan wek Soran, Sérwan, Behdînan welateki Kurdistanê ye û ew der li wextê berê mîrîtiyek bû; mîrekî lê hikim dikir. Di wî

kalê Selahedin ra Merwanê Emewî ye gotine[1]. Nizam ko ji bo ci gotinêñ holê bê mana dibêjîn. Ne şert e ko mezinatî ji bav û kalan bigehê kur û neviyan. Dîrok ji me ra xweş dide zanîn ko piraniya mezin û fatihan ji malbatêñ nexweya rabûne. Ji lewre ne hewce ye em guh bidin gotinêñ holê.

Ibin Xeldûn di dîroka xwe da koka Selahedin di bavê hevdehan da digehîne Of el Hemîrî.

Dîroknivis Stanli - Lînfol li ser Şadiyê kurê Merwan dibêje; « Ji kale Selahedin Şadî ra tarîfek nine. Bi tenê a ko der heqê wî hatiye zanîn ev e ko Şadî dostê Behrûzî Egirkî ê canecan bû. Ev Behrûz evdek bû li Dwêne dima. Paşê kele xizmeta hikûmeta Selçoqî û tê da bilind bû, heya gîha merkezeke mezin. Mamosteyî jî ji şehزادeyen Selçoqîyan ra kir».

Pîşî ko l'Ehrûz li Dwêne direve diçe nik siltan Mes'ûdê kurê Melekşah û di xizmeta siltan da digehe payene bilind, hîngâ ew ji dişîne pê dostê xwe ê canecan Şadiyê kurê Merwan tîne cem xwe u serekî li wir dihêle. Gava siltanê selçoqî, l'Ehrûz bi mihafîzî dişîne

Bexdayê, dîsa Şadî ji xwe naqetîne û tevî kurêñ wî bi xwe ra dibê. Paşê bi gotina Behrûz sultan, Şadiyê kurê Merwan li Tikritê dike walf, heya li wir diçe rehma Xwedê. Pişî mirina Şadî, Behrûz kurê wî ê mezin Necmedîn Eyûb li şûna wî dike walf. Iro ji qubeya gora Şadiyê kurê Merwanê kurd li Tikritê heye û ji xelkê wê ra nas e.

A ko mirov dikare tê bigehê, Şadî li Ecdenkan[1] serekê qewmê xwe bûye; lê ne mîr û ne ji siltan. Tevayiya dîroknivisan li ser ne-nasiya bavê Merwan bûne yek.

« Dafrat - mearif el Bîstanî » di bin bêjeya Eyûbiyan ra dibêj: « Malbatêk kurd e ko Misir û Şam vekiriye û bi navê dewleta Eyûbi hatiye nasîn. Ev malbat ji malmezinêñ kurdan û qebileya Rewadî û bavê Heziyan in. Bavê vê malbatê Necmedîn Eyûb tevî birayê xwe Esededen Şêrgî h kurêñ Şadî li welatê Azerbaycanê û bajarê Dwêne hatine dinê. Ew bi bavê xwe ra hatine Bexdayê û ketîne xizmeta mihafîzê wê Micahidedîn Behrûz ».

Ji van gotinê han mirov dikare qenc ji hev bi derxine ko koka Selahedin li kû hatiye û ci bûye.

(dûmahiîk heye)

OSMAN SEBRÎ

(1) Ecdenkan, di rex bajarê Dwêne da li Azerbaycanê dimine.

(1) Navbera Merwanê kalê Selahedin û Merwanê Emewî pirtiri çar sed sal heye. Ën ko xwestine vê gotina vala têxîn guhêñ xelkê teqez bira vê ferqa mezin ne birine.

welatî de ji bîstan bêtir eşir  
dişm û ji wan eşîran re eşîr  
Botan dibêjin. Cihê Botan  
di welatê jorîn de ye û ji  
lewre xelkê wî bi zarê bakur  
yanî bi kurdmacıñ taxêvin.

Herçî zar, ew jî bi zaravan  
li hev vedibin. Ji zaravan re  
tixûb nîne. Carina ew ne ji  
bajarekî heta bajarekî, lê ji  
gundekî heta bi gundekî din  
ferqina şanî didin.

Şam, Heleb, Bêrût sê ba-  
jaren Sûriyê ne û di wan her  
sê bajaran de jî bi erebî bi  
erebike ko em jê re sûri bibêjîn  
xeber didin. Gava sê peya, şam-  
miyek, helebiyek û bêrûtiyek  
bi dari hev dikevin û dîpeyi-  
vin mirov tavil dizane ko yek  
fî şamî ye, û din helebî ye û  
siseyan bêrûsiye. Ji ber ko  
herkeyî zaravakî xweser heye  
û hin dengan weke hev bi  
lêv nakin.

Piştî vê ravekê (fazah) em  
cardî ji xwe bipirsin ma  
« Kurdiya Potan » çî ye?  
Zimanê xelkê Botan kurdî  
ye, zarê wan kî rdmancî ye û  
wan zaravakî xweser heye.  
Ji lewre botş di nav kurdine  
de din ji zimanê xwe kîş dibin  
ko botş ne.

Herçî zimanê kovar û roj-  
nameyên Sûriyê: Ew kovar û  
rojname bi zarê kurdmacıñ  
têñ e nivîsandin û nivîsevanîn  
wan dixebeitin ko zimanekî  
yekbûyi bînin pê. Ji lewre guh  
nadin zaravayê xwe û ji ber  
vaji ve wî bi şûn de dibîlin  
û berê xwe didin zimanekî  
ayendê ï gelempêr (imûnî)  
û di vê xebatê de ji pîrsen  
zarine din jî dixwazin fêde-  
mend bibin.

Botştiya van kovar û rojna-  
man di xwediyêñ wan de ye.

Belê xwediyêñ wan kovar  
û rojnaman bi xwe botş ne.

Lê ew jî di nivîsarén xwe

## DENGÎ GİTİYÎ TAZE

Heta niho posta Iraqê ji me re « Jin » û kovara kurdî  
a héja « Gulavéj » tanîn û em bi wan sa dikirin. Îcar vê  
postê çavén me bi kovareke nû bi ronî kirin: DENGÎ GİTİ-  
YÎ TAZE. Gîfî bi mana dinyayê ye. Bi kurdmaciya] me:  
Dengê gîtiya taze yanî Dengê dinya nû.

Kovara me a nû bi her awayî héja û sezayî her pesn û  
sikranê ye. Dengê gîtiya taze, kovareke mezin û biresim e.  
Her rûpelê wê bi qasî du rûpelên Ronahiyê ne û hejmara  
wê a sisayan — ya ko gihaşte desten me — ji 48 rûpel û  
sîh klîşeyen çeleng hatiye pê.

Ev kovar sefartxana brîtanî ya Bexdayê li xwe derêxistiye  
û ev tiş li ser kovarê hatiye nivîsandin. Ev kovar ji aliyê ingil-  
zan ji keurdan re diyarîke mezin û giranbelha ye. Me ji likûme-  
ta qralî gelek minet e û em spasen xwe ên bêpîvan pêşkêşî wê  
dikin û ji kovara me a nû re jiyseneke direj û kamiran hêvi  
dikin. Ev e rûpelê kovarê ê pêşin, bi tîpêñ me ên kurdf:

## DENGÎ GİTİYÎ TAZE

*KOWARÊKI MANGANE YE, LE LAYEN BEŞI PEYWENDÎ GEŞTİ-  
YEWE, LE BALYOZXANĘYÎ BRİTANÎ DA LE BENDA DEREHÉNRI.*

### T A W E R Ü K

1 — Penca rasif tir le barey britanyayî gewre we	Tewfiq Wehbî
9 — Qezay dize kewt le Gûze	Tewfiq Wehbî
13 — Wird bûnewey cihan le dijwariyekanî cihan	Şêx Hesen Me'rûf
15 — Dêmanet be xér	Şêx Ehmed Xenî
16 — Al, şewe, maman	Kake Reşid
17 — Gestike le xurtikanî britanî	Kake Reşid
18 — Sor Con Malkolem	Hiznî Mîkriyanî
23 — Şîhreki Rencûr — Şîhreki Mirza Maref	
24 — Serkewtinî Çerçîl	Ehmed Şîkrî
25 — Piyawêk le deway tifenge we	Sîrzad
30 — Lawendenewy Zin	Tewfiq Wehbî
32 — Şîlrekanî Melikulkelamî Sine	Tewfiq Wehbî
33 — Mister İdnî siyasyekî rast e	Evdilqâdir Hesmet
37 — Puspor, aza, şareza	Tewfiq Wehbî
39 — Sê piyawî aza	Hiznî Mîkriyanî
42 — Destûri zimanî kurdî	Tewfiq Wehbî
45 — Nêwişki qewmewayî siyasi û spayî mangi	Tewfiq Wehbî
48 — Haci Ehmed	Tewfiq Wehbî

..

Ji milê din di hejmara Gulvaja meha Kanûna-paşîn de  
mijde û spasek heye. Welê dixaye Gulavéj ji aliyê kaxezé ve,  
heta niho di tengiyê de bû. Vê paşiyê nîmînendeki brîtanî bi  
navê Mr. Greys rabû û kaxeba Gulavéjê zêde kiriye. Em ji  
bi gulavéjê re ji Mr. Greys re spanan dikin.

de zaravayê xwe tucaran eşke-  
re nakin. Eşkere bikirina  
diviya bû li şûna (rabû û  
çebû) (rabî û çebî) bîniy-  
sandana.

Em gelek spasan ji kovara

me a héja û giram re dikin  
ko ew rê xistiye ber me û bi  
vê hêncetê me çêl li zar û  
zimanê kovar û rojnameyên  
xwe kir.

RONAHÎ

Xelk ji welatê  
Kurdistanê ê çiyayin  
û spehi liştine hindik  
dizanin. Ji ber ko  
siûda vi welatî di  
neşriyata te kêm e. Di heqê wi de kêm  
tişt hatine nivisandin û wesfê wi ne  
hatiye hildan.

Herçi teşkilata siyasi, di vi warî de  
ji siûda vi welati disan ne ewçend qenc  
e. Kurdên ko mişdarê wan di navbera  
heşt u neh milyonan de ye, welatê wan  
ê çiyayin û sêgoşe di navbeyna Tirkîye,  
Iran û Iraqê de hatiye lêk vekirin.  
Bireki kurdan di Sûriyê de û êline piçûk  
di deverine din de dijin. Li Iraqê qedérê  
milyonekê ne.

Kurd ji nijadê ari ne. Wesfine  
wan en xweser hene. Zimanê wan  
dimine farisiyê; lê ew bi tu awayî nakeve  
nizingi erebiyê.

Kurd bi méraniyê têne wesif-dan  
û di nav miletên dinyayê de, bi bastûra  
( binye ) bedena xwe miletê qewintir  
têne hesêb û bi xwe ji pê iftixar dikin.

Rûyê erdê Kurdistanâ Iraqê bi qasî  
Skoçlandê ye. Tê de bergehine welê  
hene ko çav kêm caran bi tiştan ji wan  
spehitir dikevin. Çiyayne rût hene ko  
bilindiya wan digehe heta 12000 peyi.  
Ji serê wan çiyan lehi û robarin dadi-  
kevin newal û navdeştine bijûn yên  
ko ji rêt û darleaman tişi ne.

Kurd di wan navdeştên bijûn û di  
lêf û pesaîen çiyan ên nizim de riz,  
ceh, genim û her texlit fêkiyan diciinin;  
wek pirtiqal, xox, hejîr, zeytûn û alûçan.

Hin gund û bajareñ Kurdistanê bi  
spehitiya bergehén xwe dikevin ber  
çavan. Rewandiz li ser pehnava çiyakî  
hatiye ava kîrin. Amediya ko bi qub û  
minareyên xwe nas e, li ser girekî bi  
çend hezar peyan bilind hatiye danin.

[1] Exbar-el-herb kovareke propagandê e ingilizî  
ye. Ev kovar li Misirê û bi zimanê erebi dertet.  
Kovarê bi vê bendê ve çend bergehén Kurdistanâ  
Iraqê ên spehi ji belay kirine.

# KURDISTAN

EXBAR-EL-HERB — 29 KANÔNA-PAŞIN  
1944. HEJMAR 53 [1]

Bajar dikeve raseri  
navdşteke dirêj ya  
ko digehe heta çiya-  
yên Iranê. Ev bajar  
dimine beledên efsa-  
newi yên ko kitêbên qedim wesfên wan  
dane. Herçî Akire, Pencewin, Koysen-  
caq bajarine kiçik lê dilriba û cazibdar  
in. Di Kurdistanâ Iraqê de bajarê me-  
zintir Silêmaniye ye.

Di şûfa kurdan de berî her liştî  
çiyayı û qewibûna wan dikeve ber çavan.  
Kurd mirovîne bîtehemîl û xudan himet  
in, bikevin ber kijan dişwariyê ji ji heq  
derîten. Hetanî iro cilên xwe ên nijadin  
werdigirin. Destmaleke mezin li serê  
xwe wer tinin, çakêt û şerwaline fireh  
li xwe dîkin. Cawê cilên wan qimaşekî  
gij e û wi qimaşî di malên xwe de ew  
bi xwe çedîkin. Rengê wan qimaşan bi  
piranî vekerî ne. Kurd ji rengên vekiri  
hez dîkin. Pişte bi xwe ve dîkin. Herçî  
ûçikên wan qederê du yordan dirêj in  
û wextê wan li zendên xwe dipêçin  
ew wek şâşikina dixweyin.

Li Iraqê kurd di ziman û girêdana  
xwe de serbest in. Bi gotinêni din heqine  
wan en mili û nijadin hatine nas kîrin.  
Bi vê yekê ji cinsiyeta iraqî ji fêde-  
mend dibin.

Ji niho de aliki ayenda ( misteqbel )  
Kurdistanê xuya dike. Belê Kurdistan  
di welatên rohelatê nizing de wê  
bibe Iswiçra şerqê. Daire rêhesinên  
Iraqê bi hevkariya wezareta nafîe  
û hêvotina qeymeqamê textê Iraqê di  
çiyayên Kurdistanê de dest bi çekirina  
otêl û mîvanxanan kirine.



## LEHİSTİKA ŞETRENCE

Mireki Hindistanê hebû; dîlhusk û zorker. Gelek zilim li xelke xwe dîkir. Xelkê dora wî dil kîrin bi pend û şiretan mirê zorker bînur ser rê. Tu havîl jê ne kîrin. Ji berovîj ve, mir heşyêj ko le şiret dikirin bi awakî li wan dîhate xezebê û ew diküstün.

Di nañ berdevkên mir de yekî zana, çeknas hebû. Rabû lehîstik şetrence tecad kir û lehîstik berşeyi mîrê xwe kir. Mir gelekit këfa xwe jê re ant.

Mir miroveki jir bû. Pişti ko hîni şetrence bû; hûr lê meyîzand û zani mexsedeke berdevkê wî ê jir lê heye.

## GULA MIN

Min di gulek nuh bişkivi  
Mizgin li dil büye bihar  
Bilbil digel gul axivî  
Dil nû ji xew büye şiyar.

Gava min mizgin daye û  
Tê da nema ne derd û kul  
Rabû ji xew hat pêşî gul  
Pêçane xwe lê çar xumar.

Sed aferin bo wî dili  
Êriş bire dêmê gulî  
Çarik li gerden herbili  
Hatin sema dêm û bihar.

Bisk û guhar hatin sema  
Eprü li ser zilfa ne ma  
Dilber li ber min her we ma  
Xani li min bû dost û yar.

Sed ah ji wan çavén di rey  
Biskên siyah dêmê di geş  
Wan gotinên şîrîn û xwêş  
Şerbet ji lêvan min vexwar.

Şerbet ji lêvan min mijî  
Heta ko dil jê bû tiji  
Qet agirê dil nakujî  
Pêti li dil da bû hewar.

Min dêm û gerdan gez kîrin  
Talanê wan xalan birin  
Destan memik talan kîrin  
Maçan ji her der bê jîmar.

## CEGERXWÎN

Mir li qâda şetrençê temasâ dikir, dîda eqîlê xwe û didit ko herçend sah mezinî hemuyan e, nukare durêji negaran bîle û tîber xwe bide Peyayêd dora wî berçîdan negaran û jê re berçavan dikirin û weçte ko peyayen wî dîhîtan kustun sah dîket destêne dîmanan û dibû hêsit.

Mir ji vi haşî ibret qûl, rêvêçuna ame bi velkê xwe re gahart û bû melikeki adil û dilovan.

Mir dixwest berderkê xwe mukafat bike. Bani wî kur û gotê. Tişte ko devê te diqne ji mun bixwaze.

Berdevk got Ezbeni pişti saxyûta min ji te duvêt li gora xanûn qada şetrençê genim bûdi min. Ez hisabê xwe dizanum.

Mir keni û got-ê: Ji zêran, ji zîvan lişkî bixwaze.

Berdenk pê da cîdê û got: Ezbeni ev besi min e

Mir got belê û berdevk tekir nik hisabdaran


Berdevkê jir genimek dani xanûn pîştu û got, du tagê wî deynin xana duocmin û bi vi awayî herin heta xana ghan.

Hisabdaran pişti çend xanan bi qelemê hisab dilutin; ji ber ko genim nema di xanan de bi cih dibûn Daowîgî gîhaştine hejmareke wele ko ew mixedai genim di hemî Hindistanô de peyda ne dibû.

Berdevkê jir, bi vi awayî, derseke din ji da mirê gewr.

GEMİLË TACDO

## QAYIXËN QEWCÜK



Carina em di danezanên serevanîyan de dixwînin ko çend balafîren wan di şerekî hewayî de ketîne behirê lê hin balafîrvan hatine xelas kîrin. Ma gelo ew balafîrvan çawan têne xelas kîrin. Bivê nevê ew bi melevanîye nikarin xwe bigehînin qeraşan, bi tenê heke şer di ser perevan re cêbûye û ew bi xwe jî ketîne nîzingî bejê. Lê heke ketîne cihina ji bejê dûr hingê ci dîkin?

Tişte ko dîkin ev e: Di her balafîre de qayixeke qewçük heye. Wextê balafîr hate hingastin an agir pê ket siwaran wê, qayixa dînepixhîn, berdidin behirê, bi xwe jî bi peraşûtan dadikevin û li qayixa kewçük siwar dibin; herweki klîşa jorîn şanî dide. Piştre balafîrine behirê seh dîkin û heke ew dîtin dadikevin û qezajentî xelas dîkin. Carina vapor jî diçin hawara qezajentîyan. Di qayixa ko klîşa me şanî dide de sê peyâ hene; yek fî birîndar e.

# DİROKA

## JINA NAPOLYON

« Ci gava Ingiliz u Fransiz »  
 « bibin vek de serdestive li »  
 « dinc bibin »  
 « Napolyon »

— 7 —

### BİRË DIDÜYAN

SERË PESİN « HESARA TÜLÖNÉ »

Dema gelé Fransız rabü ser lingan û serxwerabûyan bera malmezinan û peyayén dîn dan, bê revê tiştek li ber wan nema û hemf derbasi erdên hikümeten dorhelê bûn. Ji ber ko imparatorê Nemsayê Léopold, biraziyê melika Franseyê Mari Antiwanet bû, piraniya revokan derbasi Nemsayê dibûn û li wir neyariya serxwerabûyan dikirin. Di birê berî vî da me da bûzanfîn ko ev yeka han di navbêra Franse û Nemsayê da bû bû sebeba şereki mezin û heyâ serên melik û melikejî ji di we rê da çû bûn.

Berî pêşin leskerê Franseyê li pêş neyaran revî û heyâ nemsewîyan xwe gîhandine nîzka Parisê. Lé paşê fransizan namiseke çak rave kirin û welatê xwe ji neyaran paqîj kirin. Vêcar leskerê franseyê ê ko devce bû bû ne dixwest dev ji neyaran berde; heyâ nîvî Ewropayê rapeyî wan kir. Li ser vê xurtiya ko leşker rave kiri, hikümeta Franseyê beyanek li nav Ewropayê belav kir ko hikümeta Franseyê a nûh hergav dikare di hewara serbestixwazan biçe. Di vî warf da fermanek da fermandarên leşkeriyê ko arikariya hemî miletên ko rêu-yen vê rê ne bikin

Li ser vê beyana han berf hemî hikümetan Belçik û Sawa xwe dane ser Cimhûriyeta Franseyê. Bi vê yekâ han bû ko sersiya tîrsê xwe avête dilê hikümeta Ingiliz û serekwezîr Wiliyam Pit xwe avête pêş- Ingilizan qenc dizanîn ko heke agîre serxwerabûnê di Franseyê da venemire, teqeş dê gelek fireh bibe. Ew miletên ewropayî ko di bin nîrê zînatâ (zilm) melikiyê da bê eman mane dê wek Belçikâ û Sawayê xwe bidine ser fransizan û an bibin hevalbendan wan. Ji bo girtina pêşîya vê yekê ditîna hin hevalbend diviya bû. Hemî melîkîn Ewropayê di vê rê da ji Wiliyam Pit ne bi sù nda bûn; lê ji wan ne dihat. Herçî serekwezîrê Ingilizan bi hikmê merkeza hikümeta xwe di Ewropayê da, dikari bû vê yekê



saz bike. Bi vê ramanê bû ko li ser destê sefirîn Ingiliz dengê xwe gîhande hemî hikümeten Ewropayê. Berî hemî hikümeten İspanya guhdariya vî dengî kir û ji bo vekuslîna agîre serxwerabûnê bû hevalê Ingilizan.

Hingê welatê Franseyê bi tevayî ne di destê serxwerabûyan da bû. Herçî xelkên xér-xwazê melikiyê bi nîvroyê welêt da revî bûn û li bajarê Tülonê hikümetek çekiri bûn ko ev hikümet bi navê kurê melikê kuşfî, Léwîsé hevdehan digerandin. Kijan Fransizê ji ber zînatâ serxwerabûyan bireviya diçû bi wê hikümetê disikinî. Hikümeta Parisê a nûh heyâ wê hingê ewçend bala xwe ne da bû vê koma asiyân û bi şandina hin leşkerîli ser wan ter dikir.

Dema Wiliyam Pit dît ko xér-xwazên melikiyê di bajarê Tülonê da bi navê Léwîsé hevdehan hikümetek anîne pê û li pêş hikümeta serxwerabûyan ling didine ber xwe; jê ra hêviyeke bas çebû. Bi arikariyeke çak dikari bû wê hikümeta kiçili li Tülonê vejîne û xurt bike. Li ser vê ramanê hikümeten Ingiliz û İspanya gotina xwe kirin yek û destê arikariya xwe dirêjî hikümeta Tülonê kirin. Di tebaxa 1791an da stolêvan her du

hikümetan gihastin tskela Tûlonê û bi leşker, xwarin, çek û posatan arfkarîya asîyan kirin. Bi vê yekê hêviya Ingilizan xurt bû ko dê bikaribin agirê serxwerabûnê di welatê Franseyê da vemirînin.


Di wê demê da bû ko bextê hikümeta cimhûriyeta Franseyê keti bû mîzîna qedere. Heke hevalbendan zor bikira, dê hikümeteke melîki di bin melfikiya malbata Borbon ( navê malbata melfîkên Franseyê ) da vege riya Franseyê û ew xwîna ko gelê Fransiz di riya serbestî û wekheviyê da çar salan rijandî dê li tinê biçûya û disa welat têketa bin dest malmezinan û peyavén dîn.

Lê herçî qeder, ji bo gelê Fransiz ji daxwaza Wilyam Pit, comertir bi derket ko di wê dema dijwar da xelaskarek gîhand. Xelaskarekî wele ko ew terma ( kabûs ) daktef ser singa gelê Fransiz rakir.

Hingê, ji mêm va leşkerê hikümeta serxwerabûyan dor li bajarê Tûlonê girti bû. Lê ji ber ko Ingilizan tevî hevalbendê xwe di deryayê ra arfkarîya asîyan dikirin; ev dorgirtina han bêbelê diman. Cîma ko leşker, xwarin, çek û posat ji hewceyê pirtir jê ra tanfir û kelehen dora bajêr ji hemî xurt kiri bûn. Bi vî awayî asf teng ne dibûn û gazinda tu kemasîyan ne dikirin. Herçî hikümeta serxwerabûyan, anê cimhûriyet, ji vê domkirina han geleki dil-teng bû bû û heye ko hêviya wê ji ji serdestiyê qels dibû. Lê bûyîneke ne di hesêbî da ew hêviya qels vejand, bajarê Tûlone éxiste destê cimhûriyettê û erdê Franseyê ji tovê neyarêñ der û hundir paqî kir.

Di meha flona 1793an da emir da bûn sersemer ( yûzbaşî ) Napolyon ko here ser firqeyâ li bajarê Nisê. Riya wî bi bajarê

## SERÊ İTALYAYÊ



Serê Italyayê héj dom dike û ordiwan hevalbandan ber bi Romayê diçin. Lê ji ber nexwesiya hewâyê, berf û baran û sermayê ordiwa ingiltzan a heştan û ya emêrikanîyan a pêncan hêdika lêbelê bi xurîlî pêş ve diçin. Di vê seferê de hevalbendan çek û aletine nû bi kar êxistîne. Klişâ me topeke emêrikant bimotor û eskerine ko dadikevin bejê şanî didin.

Tûlonê diket. Ji rasthatineke çak, qumandare topavéjan berf rojekê bi birfîneke xedar birfin-dar bû bû û nema dikarî karê xwe bike. Di wê demê da hatina Napolyon ev kemasîya han tije kir û li wir hate sekinandin; heya qu-mandarê topavéjan rihet dibe û tê ser karê xwe.

Gava Napolyon bala xwe da karê ko jê ra hatiye sipartin, gelek kêmîyên mezin tê da ditin. Berê topan da bûn nava bajêr; lê guleyên wan xwe ne digihandin nîvê rê. Napolyon rézika qumandarê berî xwe ne eciband. Berê topan bi carekê guhazte kelehan dor bajêr; ci gava ew standin ko topan li s'r wan kelehan saz bike û pê cengkeşiyên di îskelê da birevîne. Bi vî awayî bajêr ji asiyân û welêt ji ji neyar'an paqîj bike.

İngiliz ji di hêla xwe va li vê yeka han kang (xasîl) ne ma bûn. Dema lingén wan bi erdê Tûlonê keti bû, berî her tişît keleb bi topan xurt kiri bûn. Xurtiyeke welê ko her leşkerekî nikari bû ew keleb vekirana. Lê bextê ko hercar ji Ingilizan ra dibû arîkar, qey ko vê carê rû ji, wan diguhast, ko neyar'ekî weki Napolyon i jîr, jêhatî û serhişk diêxîste pêşberî wan.

Napolyon ji di aliyê xwe va dijwariya karê ko girtî bû ser xwe bir dîbir. Lê dilê wî é mezin ne dixwast li ber tû dijwariyan qels bimîne; ji ber ko bêjeya «nikarinê» di fershenga sersemere korsîkayî da tine bû. Çiqas kar û xebat li ber wî dijwar dibûn; dilê wî ewçend zexim û vêna wî hinde xuri dibûn. Bi tenê di pekanîna vî karê han da ew hewceyî tiştekî bû ko ew ji selahiyet; anê di kar û xebatê da ew serbest hîstîn. Di eniyeke ko leşkerekî mezin tê da û li ser wî leşkerî du sê general hebûn, bê şik dengê sersemerekî nedihate bîhistin û bî rê û rîzana ko wî danîna ne dihate emel kîrin. Teví vê yeka berbiçav, Napolyon ji ne zabitê ko ji bo dilxwesiya mezinîn xwe dev ji zanîna xwe a rast berda.

Di roja pêşin da gotinê sersemere Napolyon û serleskerê wê eniyê general Karto li ser tevdîra şer ne bû bûn yek. Napolyon xiteya mezinîn xwe


ne dieciband û ji bo vekirina Tûlonê xi yekê xweser didane ber wan. Qumandarê sir-qeya milîendisan xiteya Napolyon baş didît. Lê serlesker Kartoyê ko xwe dinepixand û ji wê pê va tiştek ne dizanf; ne dixwast zanafî an şareziyatî zabitê topavêj ê bîst û çar salî li ser xwe qebûl bike. Heya rojekê li ser vê tevdîra han di civîna qumandaran da qirêneke biçuk bû bû. Napolyon tevdîra xwe bi ser û ber ji wan ra digot. Hinekan ji haziran mîldariya wî dikirin. Lê «no» gotina general Karto pêşîya her tişît digirt. Hingê jîna general gote mîrê xwe: «Dev ji vî xorf berde. Ez dibînim, di tevdîra şer da ew ji te ra zanafî zanafî jêhatitir e. Bihêle, çawan jê ra xwes e bila welê bike. Talfî çiya baş bibe dê ji te ra serbilindî bête zanîn».

Gotinîn holê tiştek ji tevdîra general Karto ne diguhart. Di wê demê da bû ko ji sandîyên mîlet (naib şeib) Xasparan bi rasthatin çû bû qerargaha lesker û qirêna di navbora Napolyon û general Karto da bîhisti bû. Gava şandî Xasporan ji mîldariya Napolyon dike

édfî nema Karto serhişkîyê dike, bê gotin tevdîra Napolyon qebûl dike û destê wî didê(1). Di wê wextê da bû ko general Karto xwastin Parisê û general Dûgomyê li şûna wî bû serlesker. Herçî Dûgomyê û art-karê wî general Dutayl ne weki Karto dexsok û nezan bûn. Wan ji Napolyon ra qedireke welê mezin digirtin ko tucaran ew qedir ji bindesten xwe ra ne girti bûn.

Piştî ko ji bo tevdîra şer destê Napolyon jê ra hate dayîn, berê du sed top guhaste keleha ko di roavayê bajêr da Ingilizan xort kiri bû. Xurtiyeke welê ko navê wê kiri bûn «Cebel Tariqa biçuk». Şer bi awakî nuh dest pê kiri

(1) Destê wî didê, anê wî di kira wî da serhest dihêle.



Qranê Ingîlstanê tacîdar Corc. Qran alaya sagîrlîn unîvîrsitî teftîş dike.

## REWHANI Ù BIYANÎ JI ME KURDAN ÇI DIXWAZIN?..

Rewhaniyên me û hin biyaniyên ko di nav gelê kurd da pir caran digindirin û dikevin nav riya me, bi hin kirdeyên gelêri, piçûk û mezin me divarqilsnin û digivêşin. Gelek caran dijwariyê li me û xebata me dikin. Niho ú berê ji em birindarê ramanan kirine û dikin. Em bi zimanekî tevayî ji wan ra dibêjin û hêvî dikin ko ev dilreşî di nav me û wan da hévanekî tirş negire û nebe « tirba sîpî û marê qut »..

Perf vê çend pêştevayê wiha hatine belav kîrin. Lê mexabin tûkesî pax û perwa pê ne kiriye. Lewie serî ji guh nayê dagirtin; lê çav-ditîn perda dil tenik dike. Dilê me k. rdêñ welañ, ne ji bo berberiyê, lê ji bo azadiya xwe û parastina ayê cîran û nejadêñ ko di nav me de ne. Heye ko ew dibêjin. Kurdistan daire xv.e

bigire emê roj bi roj këmbîha û bê pergâl bimîn; lewre van serhişkiyan dikin.

Mexabin ev xiyalêñ ha nayêne bîra me. Deftera stemkariyê ne ketiye çapa heşê me û ev sîxensazî naeve ber xana zimané me. Nemaze van xêzén reş em li qedera xwe dinivisin. Hingî me jarî û bindestî diye; zorkerf û çavşorîyê li tu nejad û gelînakin. Tu kes nikare neyartiya doza me bike, bi tenê bi dilxweşî û camêrî em dibin. Xûyê kurd mîna şer e. Gava serdestî hevalê xwe ne dilovan û nerm in û benga dikevin tengî û bindestiyê zirz û sert dibin

Bila tu kes ji destdirêjiya me netirse; em he şinas in. Tarix dilovaniya me bercav dike. Çawan ko lawê Mi efe, dibêje: « Medî û iranîyan cîranen xwe ji dest Rom û frêngan kuta dikirin, bê ko wan bêxin Lin siya xwe, bi azadarî ew dipan. Ji ber vî ji me ra digotin: ( ebna el ekrad ). Pişî İslamiyete ji me re

gotin mewali, bi mana ebîd an kedi tê gotin. Bo ci bêjîm, li ber kêlêñ mezeran pesin nabe. Ji xwe bi rastî dilovaniyê em ketin. Tu kes casî me ji welatê xwe hez nake. Ji bindestî û namûs û din me terk dida û mihaicir dibûn. Gelo xeymî kurd kê leqebla mihaicir wek qerpal bi stoyê xwe da kiriye. Heke me ji wek hevalen xwe bikerana di sala 1918an de em ji ji bin siya qeqel, tajîyên çavzer kutah bibana.

Cawa ko Cizerî gotiye:

Mislê goyê bê ser û pa Mane li ber der û şeka.

Cizir: 10,1.944

HESEN HIYAR



BERGEHEK JI COTKARIYA WELATÊ INGILÎSTANË

bû. Napolyon bi dil û can xwe da bûyê. Xwedayneke wêlê ko di mecalâ berika ti! ngê da li pêş neyarân di nav leşkerê xwe da bi siwarf diçû û dihat. Du-sê hesp di bin wî da hatine kuştin; tevî wê ji a xwe ne dima. Her ko hespek di bin da dihate kuştin, wî xwe hîn pirtir nîzîkî neyarân dikir. Heya rojekê

ewçend nîzîkî neyarân bû ko bi serberzek ( neferekî ) ingilîz va bi destelepê trahiştine hev û di binhêla çokê da birfîneke mezin lê bû: tu nema ko ji bo wê birfîne lingekî wf bilhata jêkirin. « dûmähîk heye »

OSMAN SEBRÎ

# CÊWIKÊN

*SIYAMÎ ÈN BI HEV-VE*

Gelek jin hene ko cêwikan ditinîn. Hinan ji di zikekfî de sê, çar zaro anfîne, herrek bi serê xwe. Lé cêwikan siyami yê ko em fro dixwazin qala wan bikin; cêwikanine bi hev-ve bûn; bedenine cihê lé bi hev ve zeliç. f.

Çirok kevin e; heye ko piraniya xwendevanên me pê dizanîn. Lé vê paşiyê me di kovareke emêrikanî û di heqê van cêwikan de tefsilatine nû dîtine. Em dikin wan berpeyf xwendevanên xwe bikin.

Cêwinken siyamî di sala 1811ê de di gundekî Siyamî de, nîzingî l'ankokê, ji diya xwe bûne.<sup>[1]</sup> Bâvê wan i çîñî, diya wan bi nîv siyamî bû. Lé ji ber ko di Siyamî de bûne, bi navê cêwikan siyamî deng dane. Navê yekf Çang û yê e din Ing bû.

Birayêن cêwik bi hev re radibûn, rûdiniştin û radiketin. Bi tenê Ing ji birayê xwe bi qasî tilîkê direjîür bû. Ji lewre ji Çang re soline bi piştpehniyine ji yêñ birayê wf bi tilîkê bilintir cedikirin da ko bikarin bi hev re bi rê ve biçin.

Birayêن cêwik di gundê xwe de mirîşk bi xwedî dikirin û hêk difrotin. Gava yekf dest bi gotinekê dikir e din dikarf bû wê gotinê timam bike.

Çang û Ing bû bûn 18salf. Rojekê, vaporeke emeriyanî di bendereke Siyamî de lenger avêt. Keptan birayêen cêwik dîtin, ew qanî kirin û bi xwe re birin Emêrikyê, bajare Bostonê. Ji Emêrikyê ji ew birin Ingilterê. Xelk li wan ecêbmayî diman; diktör li wan hûr dibûn; digotin xerîbeke xilqetê ne.

Rexma ko bi hev ve zeliçî bûn bi her karf radibûn. Qederê 10 kflometiran bi rê ve diçûn, mîlevanî dikirin; çend caran çûn nêçfrê ji. Gava radizan rûyê xwe didan hev û bêf ko ko hevûdin hisyar bikin ji alîkfî diqulipin aliyê din.

Selîteke goştin, qederê deh sentîmetiran dirêj, dora wf qederê 20 sentîmetiran, ew bi hev re digirtin. Diktoran di heqê wê selîte de gelek tişt gotin û texmîn kirin. Lé beriya mirina wan nikarf bûn bihatana qerareke. Pişti mirina wan gava bedena wan qelaştin hingê zanîn ko heke selît di jiýfna wan de bibirana her du ji wê bimiriyana. Wextê ko derziyek di orta selîta goş re dikirin her du cêwik pev



*Eskerén ordiwa heştan dadikevin beja İtalyayê, re pê dihesiyan. Lé heke derzî di aliye rastê bikirana hingê bi tenê cêwîkê aliyê rastê pê piheşıya. Li milê çepê ji wele bû.*

Di zarotiya xwe de bi xuriyê keti bûn. Di rojekê de nexwes bû bûn û di rojekê de sax bûn. Wextê mezin bûn yekf serab vedixwar û serxwes diket. Yê ko venedixwar seraba birayê wf le kar ne dikir; weke xwe dîma û li birayê xwe û serxwes temaşa dikir.

Cêwikan siyamî cardî ji Ingilterê vegeriyan Emêrikyê. Gelek pere da bûn hev. Lé rîberê wan pere bi xwe re bir û revî û cêwik li erde biştin. Lé birayêen cêwik di midekî kurt de qederê 60,000 riyali pere dane hev û ne ketin têngiyê.

Li Ingilterê tiştekî ecêb li wan qewimî bû. Dilê keçîkekê bi navê Sofya û ji maleke genc bi wan keti bû. Keçikê ew her du bîrayen bi hev ve miroveki bi tenê dihesiband û dil dikir bi wf mirovi bizewice. Lé diktoran digot ko ew ne miroveki bi tenê ne; herrek bi serê xwe mîrek e. Ji lewre keçikê ew ziwacê bikira wê bibiwa jîna du mîran, jîna du biran. Ji ber vê yekê Sofya ji wê ziwace giyera.

Di rastiye de mirovine bi ser xwe bûn. Herweki me got yekf şerab vedixwar, serxwes diket, e din pê ne dihesiya. Gava bi şetrenç dileyistin di lehîstikê de hergav ne

[1] Ji welatê Siyamî re fro Teyland dibêjin.

di yek fikrê de bûn. Di sala 1847an de gava serekcimhûrê Emérîkê dihate bijartin heryekî dengê xwe da bû namzedekî din.

Dawiyê her du bira zewicin û heryekî ji xwe re jinek anî. Belê di sala 1843an de Çang û Îng di wilayeta Karolînê de birayên céwîk du keç, xwehêñhev, nas û ji wan hez kiri bûn; Edelâyid û Sarêan, keçen Yits. Keçikan ji ji wan hez kiri bû. Edelaîd bû jina Çang, Sarêan ji jina Îng.

Lê céwikan bi jinbrayê xwe ne dikirin. Rabûn ji hev qederê nîv saetê dûr du xanî çekirin. Her kebanî di xanîkî de dijî. Cêwîk ji bi dor sê rojan di xanîkî û sê rojan di xanîyê din de diman.

Piştî ziwacê qederê sih salî emir kirin û ji wan re 22 zaro çêbûn. Îng heft kûr, pênc keç hebûn. Jî Çang re ji heft keç û sê kur çêbû bûn. Tev de zarowine lihevhattî û jîr. Ji keç û kurekfî pêve, yêñ ko ker û lal bûn.

Cêwikan bi cotkariyê mijûl bibûn û digel

zar û zêç têr nan dixwarin. Di sala 1874an û li 23ê Kanûna-paşin di nav du saetan de, li pey hev mirin. Dibêjin ko Çang şerab vewxgar bû û di derengiya şevê de, di bin baraneke xurt de vegeriya bû mal. Welê dixuye bi rê ve serma hilanî bû. Li ber destê sibehê Çang hisyar bû bû. Eşek bi sîngâ wî keti bû. Çang ji nav cihan rabû û li ser kursîkî rûnişt. Destê xwe kiri bû sîngâ xwe û dînalî. Îng dixwest rakeve, Pev re dan û standin. Dawiyê Îng birayê xwe kişandê nav cihan û raketen.

Piştî du saetan Îng hisyar bû û ji kurê xwe pîrsî: « Mamê te Çang çawan e? »

Kurê wî lê vegerand û got: Canê wî sar bûye, bawer bike miriye.

Îng dest bi girf kir û gote jina xwe: « Edî ez ji ezê bimirim ». Piştî du saetan Îng ji, yê ko ji tu tişî ne teşîha, ew ji mir.

Kelaşen wan di tibiya Filadelfiyayê de kelaştin û teşîhî kîrin. Çang ji ber sekta dil miri bû. Herçî Îng tu nexwesî lê xuya

ne dikir; diviya bû ji tîrsan miri be. Teşîhî dazanîn ko heke di ji-yîfna wan de selîta göst bibiranâ her du ji di cih de wê bimirana.

Smainê Serhedi



Eskerîn  
britani têlén  
bi derzi yêñ  
ko elemanan  
vegirti bûn  
dibirin û qes-  
ta pêş dikin.

Stola he-  
valbendan di  
Pesisikê de  
berdidin gira-  
vîn ko japo-  
nên ew di  
destpêka şerî  
de bi nişke-  
gavîyê vegirti  
bûn.



MERÊŞAL  
LÜKSENBURG

Di sala 1692an de bû. Merêşal Lüksenbûrg bi hefté hezar fransız re şerê ingiltz û holendigian dîkir. Ew di bin fermândariya Gwiyom Doranj de bûn.

Gwiyom neyareki xurt û héja bû. Merêşal bert bi rojekê ji sedi bêtir casûs berda bûn dora gerargaha neyarê xwe. Yek ji wan halî bû gitin. Zabitén Gwiyom zor dan-ê û jê re raporeke liheviwarkirt dane nivisandin û ew şandin gerargaha merêşal.

Merêşal li gora wê raporé eskerén xwe xistî bûn réza cengê. Gwiyom yê ko rézika dijmînê xwe dizant bi spêde ve li baskekî wi i qels da û ew şkénand. Merêşalé pir, rexmâ nexwesîya xwe, siwar bû, rézika xwe guhartî li dijmîn vegeeria û piştî sê hicúman ew şkénand.

Gwiyom ji vê şkes-tinê gelek qehîrî bû. Rojekê gote xelkê: Ezê zora wî qofî kengê bibim.

Merêşal gava ev bîhist got: Ma ji kû dizane ko ez qof im; tucaran wî ez ji par re ne dîtime.

QAYIXEN KEWÇUK



Di rûpelê 17 an de bi vê sername nivisar û klişeyek heye. Klişeyen jorin ji xelaskirina balaflîvanên qezajentî şanî didin.

A pêşin: Balaflîreke bejê li rûyê behîrê û di nav qayixike kewgûlî de balaflîvaneki qezajentî ditîye û bi bêtêlê elam daye motorbotekê; motorbot ji hatîye hawara qezajentî.

A didowan: Ev klişê motorbokeke xaça sor şanî dide. Ev motorbot di behira Manşê de ye. Di vê motorbotê de bêtêlek, derman, xwarin, cil û tiştine din yên ko ji qezajentîyan re divêtin hene. Qezajentî piştî ko xwe ji balaflîrê tavêjîn û li qayixa kewçük siwar dibin heke rasî yan vaporêna xaça sor tê, li wan siwar dibin û bi bêtêlê elam didin merkezê. Heke birçî ne dixwin vedixwin; birîndar xwe derman ji dikin. Di vê navê de hawara wan têt û qezajentî vedigerin bejê.

Ji bo Sûriyê 10 lireyên sûri — Ji bo welatên din lîrekî ingiltzî û niv

Xwedî û gerfinendeyê berpirsiyar : Celadet Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie